



Mistefa Hicrî:

“PDKÎ li hemberî bahoza bihêz ya bûyeran xweragir bûye” ...» 2



“Ji Xoy û Makûyê heya Kirmaşan û Îlamê, xelkê rû li rûgeha xebata neteweyî kirin” ...» 5

Kerîm Perwîzî:



Ebdulla Resûlî

“Min di 65 emeliyatan de, beşdarî kiriye”. ... 8

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# AGIRÎ

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (223) 05-02-2014 Buha (500) Tûmen

**Katrîn lihevhatina Cenêvê zehmet dibîne**

Katrîn Eşton berpirsyara Siyaseta Derekî ya YE’ê ragehand ku di civîna pêşiya me de, ez zehmet dibînim ku em li hev bikin, û ew civîn renge şeş mehan dom bikin.

Wezîrê Karê Derve yê Îranê jî ragehandiye ku hekî gotûbêjên me negihîjin tu encamekê, emê dest bi mehandina Oranyomê li serveyî %20 bikin.

## Opozîsyona Sûriyê:

# Rûsiye! Êdî bes e, dev ji Beşar berde




**Endamê heyeta opozisyona Sûriyê di danûstandinên Cenêvê de, Bedir Camûs daxwaz ji Rûsiyê kir ku piştgiriya rejîma Esed neke.**

jiber ku me hewil da ku rejîm tevlî çareseriya siyasî bibe, lê bi gotina wî rejîm her girêdayî bijardeya leşkerî û ewlekarî ma.

Ji aliyekî din ve Ehmed Davûd Oxlo jî ragehand ku şerê Sûriyê nêzîkî me jî bûye, lewra Beşar Esed berpirsyarê rewşeke bi vî awayî ye, û hêzên me neçar in ku teqê li karwanên Daîş li ser sînor bikin.

Di Cenêv 2 de, Opozisyonê nekarî rejîmê neçar bi qebûlkirina veguhastina deshilatê bike, û Kurdên beşdar jî ragehandin ku heya ew yek nehê cîbicî kirin, em nikarin pirsa Kurd di civînên weha de bînne rojevê.

Sergotar

## Perwerde, pîlanên neyaran!

Şehab Xalidî

Endameke ferhengistana ziman û edebiyata Farsî bi navê Fethulla Muctebayî ragehandiye: “Min şik têde nine ku mijara xwendina bi zimanê dayîkê, ji dervayî welat hatiye Îranê, û baştirîn alav bo paşvehêlana her neteweyekê guhnedan bi zimanê wan e, û hekî em bixwazin zimanê dayîkî weke zimanê zanistî û perwerdeyî bi kar bînin, ev yek cihê metirsiyê ye û bêhna pîlanan jê tê.

Cuda ji deshilatên din ku pêşiya xwendina bi zimanê dayîkê di çendîn salên borî de girtine, deshilata niha jî berevajiyê benda 15’ê ya yasaya bingehîn ya Îranê kar dike, û mafê herî mirovî, destûrî, û şer’î ji Kurdan standiye, û bi vê siyasetê dixwaze zimanê gelan di nava Farsî de bimihîne.

Lê ew bixwe baş dizanin ku hekî di salên borî de, bi pêşîgirtina ji perwerdeya bi zimanê dayîkê dikarîn pêşiya pêşkevtina ziman bigrin, lê niha bi sedema wan hemû emrazên ragehandinê û torên civakî, ku zimanê Kurdî bi kar tînin, û bi wan civînên ku li ser zimanê Kurdî têne girtin û pirtûkên ku bi Kurdî li derveyî Îranê çap dibin, êdî helandina ziman ne karekî hêsan e.

Lewra ya baş ew e ku hem zimanzan û hem jî karbidestên rejîmê di cihê êrîşa bo ser zimanê neteweyan, bîr ji cîbicîkirina benda 15’ê ya yasaya bingehîn ya welatê xwe bikin, û bi vî awayî hêrsa neteweyên bindest bilind nekin, jiber ku siyaseta dijberiya bi perwerdeya zimanê dayîkê, neteweyan zêdetir ber bi hînbûn, û hewldan bo pêşvebirina ziman pal dide.

Siyaseta dijayetiya digel perwerdeya bi zimanê dayîkê, ne tenê welat yekparçe nahêle, belkû hewla xwe bi bîhanîzanîn û cudabûnê di hundirê takên civakê de perwerde dike.

# Deqa peyama rêzdar Mistefa Hicrî sekreterê giştî yê PDKÎ, bi boneya 2’ê Rêbendanê li bajarê Silêmaniyê

Ez gellekî kêfxweş im ku îro digel we beşdarên hêja li bajarê Silêmanî, bajarê Şêx Mehmûdê nemir, paytexta rewşenbîriya Başûra Kurdistanê, em yad û bîra 68’mîn salvegera avakirina Komara Kurdistanê bilind binirxînin.

Rêzdarno! Her wekî hûn agehdar in, 68 salan berî niha di roja 2’ê Rêbendana 1324 (1946) Komara Kurdistanê bi hewl û tekoşîna Partiya Demokrat ya Kurdistanê (PDK) û bi serokatiya Pêşewa Qazî Mihemed li bajarê Mehabadê hate avakirin.

Temenê vê Komarê kêmtir ji salekê bû, lê deskevt û bandora siyasî û civakî ya wê qonaxa bi çirûsk a Komara Kurdistanê, bo neteweya Kurd gellek bûn, û gellek caran jî bas jê hatiye kirin, lewra gellek bi kurtî emê qala çend xalan di vê derheqê de bikin:

- Bi avakirina Komara Kurdistanê di dîroka nû ya Kurd de, siyaset tê eqlanîkirin, eva jî ji riya avakirina dem û dezgeh û damezraweyên modern ên deshilatdariyê, û rewayetîpêdana vê deshilatê ji aliyê xelkê ve, û herwisa karkirina siyasî di çarçoveya sîstemeke modern de, ku ew jî partiyeke siyasî yanî (PDK) ye. Ew şêweya deshilatdariyê di tevgera rizgarîxwaziya Kurd de, diyarokeke gellek serdemiyane ye.
- Bilavkirin û geşepêdana dîtingehên nû li ser hikûmet û deshilatdariyê, û pêdagiriya li ser “mafê diyarîkirina çarenûsê” li ser bingeha hilbijartina hişyarane ya takên Kurd.

- Berfirehkirina azadiyên giştî bi taybetî azadiya bîr û ra eşkerekirinê, û pêkanîna rêkxiraw û kom û komeleyên cur bi cur.

- Geşandina morala nasyonalîstî li ser bingeha regezên demokratîk, bihêzkirina emegdarî û girêdayîbûna siyasî ya takên civakê, û hêz û girûpan bo deshilata Kurdî, di cihê emegdarî bo tak yan eşîre, yan herêmekê.

- Çapkirina pirtûk û rojname û kovarên cur bi cur bi zimanê Kurdî, û hewildan bona nehêlana nexwendewariyê.

- Hildana alaya Kurdistanê û destnîşankirina sirûda neteweyî



wekî berjengên (sembolên) modern ên neteweyî.

- Giringîdana bi geşepêdana mirovî ji riya xwendewarkirin û herwisa perwerdekirin û şandina xwendekaran bo derveyî welat, bi armanca xwendina ji bo avakirina Kurdistanê, û bi dehan deskevtên din.

Bi van sedeman û gellek sedemên din, 2’ê Rêbendan ew qonaxa dîroka ya neteweya me ye ku bûye beşek ji bîreweriya bi kom ya Kurdan di hemû parçeyan, û ji bo hemû Kurdan bûye bingeheke modern bo nasnameya neteweyî ku îdeyên xwe di serdema hevçerx de radixe ber çavan.

Lê hewce ye ku em çi wekî netewe û çi jî wekî tevgereke rizgarîxwaz, ji bilî şanazîkirina bi vê qonaxa dîrokî ya bi nirx, em dibe hewlê bidin ku bi xwendina zanistî, bo rewşa wê serdemê, sedemên dirustbûn û serkevtina wê Komarê, û têkçûna wê, ji xalên bihêz û lawaz ên wê dersê werbigrin.

Sedemên têkçûna Komara Kurdistanê ji bilî sedemên navxweyî ku gellek bas jê hatiye kirin, hewce ye ku em di sedemên pêkhateyî de bibînin, bi taybetî bandora rikeberiya mezinhêzan, em dikarin di vir de wekî bandora “pêkhateya sîstema navdewletî” pênase bikin, ku li cem sedemên navxweyî ên Îran û Kurdistanê, roleke bi bandor di bidawîanîna vê komarê de lîstine.

Em îro dikarin baştir xwendinê bo sedemên hiloşîna Komara Kurdis-

tanê û herwisa lîstikên mezinhêzan, û rol û pêgeha Kurd di vê rikeberiyê de bikin.

Bi baldana bi guherînên piştî her du şerên yekem û duyemîn ên cîhanî, guherîna li ekterên herêmî û navneteweyî, jinavçûn û hiloşîna hindek welatan, û lawazbûna wan ji aliyekê û hatina bo ser şanoyê ya hinek ekterên din ên nû ji aliyekî din ve, pêkhateya sîstema navneteweyî guherîn bi ser de hat, bi vê wateyê ku ji pêkhateya sîstema hevsengiya hêz ve hate guherîn bo pêkhateya sîstema du cemserî.

Lê xala cihê baldan û lêfikirînê ew e ku di qonaxa demî ya di navbera wan guherênan de heya formgirtin û avabûna sîstema nû ya neteweyî, ku bandor li ser şêweya lîstikan û siyaseta navneteweyî û heya hejmar û cureya ekteran, (dewlet, yan rêkxirawên navneteweyî) heye, valahiyek pêk hat ku derfet ji bo me Kurdan jî pêk anî da ku qewareyeke nîve serbixwe ya neteweyî, wate Komara Kurdistanê, em ava bikin.

Lê bi derbazbûna dem û cihgirbûna vê pêkhateya neteweyî em dibînin ku dawî bi Komara Kurdistanê jî tê, û cureya rikeberiyê, rê û şûnên lîstikên navneteweyî û jeopolîtîkî, û siyaseta navneteweyî guherîn bi ser de tê. Di vê navberê de Kurd wekî ekter yan bikereke navxweyî yan herêmî tê vêdedan, û dibe qurbaniyê cihgirbûna pêkhateya sîstema du alîtî, û rikeberiya mezinhêzan, û bi giştî siyaseta navneteweyî.

Dîroka vê du cemseriyê û ezmûna serdema şerê sar, ew yek selimand ku di çarçoveya pêkhateya vê sîstema navneteweyî de, mafên neteweya Kurd di vê herêma hestiyar ku Kurd têde ye, bi dest ve nahê, û berjewendî û rikeberiyên navneteweyî li serveyî hêz û îradeya Kurd de ye, lê digel bidawîhatina vê sîstema du cemserî û hiloşîna Yekîtiya Soviyetê, dîsan çendîn qeware û dewlet yan ekterên nû têne nava qadê (meydanê), û rê û şûnên lîstikan jî diguhere, bi vê pêkê jî komeke norm û nirxên nû, û derfet ji bo neteweyên bindest pêk tê. Bingeha destêwerdana mirovî û berpirsayetiya parastina navneteweyî li ser bingeha mafên mirovan tê holê.

Pirsa "Demokrasî" û "Mafê dîharîkirina çarenûsê" dibe pirseke cîhanî. Herwisa xwezaya rikeberiyan jî diguhere, di encama vê guherînê de, derfetek jî bo Kurdan di beşeke Kurdıstanê, (di Başûra



**xala cihê metirsiyê ew e ku hekî em wekî kurd, bi derswergirtina ji sedemên navxweyî ên hiloşîna Komara Kurdistanê nekarin derfeta hewce bi dest bixin, û di vî heyamî de ku pêkhateya sîstema nû ya navneteweyî, yan herêmî form negirtiye, em nekarin mafên xwe bi dest bixin, piştî cihgirbûna pêkhateya sîstema pêşiya me ya navneteweyî, renge em nekarin, yan jî gellek bi zehmet em bikarin vî karî bikin.**

Kurdistanê) pêk tê, û Kurd jî mifahê lê werdigire.

Xala cihê baldanê di vir de ew e ku di nawendên zanistî ên siyasetê û pêwendiyên navneteweyî de, qala vê yekê dikin ku ew qonaxa wekî qonaxa veguhêz yan derbazbûn û veguhastinê tê nasîn, di vê qonaxê de, hêşta pêkhateya sîstema navneteweyî form negirtiye, û zelal jî nine ku wê bibe çi sîstemek, lê dîsan jî guherîn di rê û şûn, û yasayên siyaseta navneteweyî û parvebûna hêz, û heya di rejîmên siyasî û hatina ekterên nû de, her berdewam e.

Em îro vê rastiyê di bûyer û guherînên parên din ên Kurdistanê (Turkiye, Îraq û Sûriye) bi awayekî zelal dibînin.

Di vir de ye ku ezmûna têkçûna Komara Kurdistanê ji me re digel wan xwendinan ku me bilez basê kirin, tê girêdan, û me pal dide ku em li gorî wan rastiyan, dîtingeh û siyasetên xwe darêjin, û ragehînin ku derfeta dîrokî ya hewce ji me Kurdan re pêk hatiye, û Kurd wekî ektereke herêmî di van guherînan de rol heye û bi bandor e, lê xala cihê metirsiyê ew e ku hekî em wekî kurd, bi derswergirtina ji sedemên navxweyî ên hiloşîna Komara Kurdistanê nekarin derfeta hewce bi dest bixin, û di vî heyamî de ku pêkhateya sîstema nû ya navneteweyî, yan herêmî form negirtiye, em nekarin mafên xwe bi dest bixin, piştî cihgirbûna pêkhateya sîstema pêşiya me ya navneteweyî, renge em nekarin, yan jî gellek bi zehmet em bikarin vî karî bikin. Jiber ku renge parvebûna hêz û lîstika ekteran li serveyî îrade yan xwestekên me be.

Wê demê berbirûbûna digel vê sîstema neteweyî û têkdana pêkhateya wê û hewildana bo pêkhatina sîstema dilxwaz renge li gorî hêza me nebe, û dîsan em bibne qurbanî, û bibne bindest.

Yek ji sedemên serekî yên navxweyî, yên nemana Komara Kurdistanê, bîra berjewendîxwaziya girûpî, eşîrî û takekesî, di nava beşek ji ekterên bi bandor ên Komara Kurdistanê de bûye, ev rastiya piştî hiloşîna Komara Kurdistanê û



**Niha piştî derbazbûna 68 salan, sîbera biyom ya van sedeman, bi awayekî îroyî di rûniştina rojane ya hinek ekteran, wekî hejmûnîxwazî, hêvîdarbûna bi dijminên neteweya me, û berçavgirtina berjewendiyên hizbî û girûpî li hemberî berjewendiyên neteweyî, em hest pê dikin, û em nîgeran in ji vê ku bi domandina vê pêvajoyê, carek din ew derfet ji nav biçin.**

dagîrkirina herêmên li jêr deshilata Komarê, ji aliyê hêza Mihemedriza şah ve eşkere bû, û herwisa zelal bû ku di heyama temenê kurt ê Komara Kurdistanê de, wan aliyan bi armanca parastina berjewendiyên xwe, di bin de, digel hikûmeta Tehranê pêwendî hebûn, û îxanet bi Komara Kurdistanê kirine.

Niha piştî derbazbûna 68 salan, sîbera biyom ya van sedeman, bi awayekî îroyî di rûniştina rojane ya hinek ekteran, wekî hejmûnîxwazî, hêvîdarbûna bi dijminên neteweya me, û berçavgirtina berjewendiyên hizbî û girûpî li hemberî berjewendiyên neteweyî, bi ser xwe de, em hest pê dikin, û em nîgeran in ji vê ku bi domandina vê pêvajoyê, carek din ew derfet ji nav biçin.

Lê li serveyî hebûna van xalên nîgatîv, xaleke hêvîbexş ew e ku bi giştî ew dewletên ku Kurd bi ser de hatiye parvekirin, (bitaybetî Komara Îslamiya Îranê) nikarin bi vî awayî berdewam bin, û bixwe jî dibne beşek ji dîroka borî ya vê sîstema navneteweyî, jiber ku rejîmên dîktator û totalîtêr bi sedema rikeberiyên jeopolîtîkî, û pêkhate û normên sîstema niha, bi hêceta parastina aramiyê, û pirsa tenahiya neteweyî, karîne bi her şêweyekê be, mana xwe û rejîma xwe dirêjiyê pê bidin.

Lê di vê sîstema nû de ew cure dewletane bixwe bûne gef li ser cihgirbûn û tenahiya navxweyî û navneteweyî, wate bûne ekterên dijî norm, û dijî wan rêsayên pêkhateya nû.

Wekî mînak Komara Îslamî ya Îranê ye ku dijayetî û gefxwarinên wê li dijî norm û yasayên navneteweyî, bi alîkarîkirina digel terorîzma navneteweyî, û têkdana tenahiya welatên herêmê û binpêkirina metirsîdar ya mafên mirov di navxwe de, wekî îdamên siyasî û tirsandin û şopandin û ...hwd, her hemû jî li dijî pêkhate û sîstema navneteweyî ne.

Lewra xwendina Komara Kurdistanê li paradaym û çarçoveya pêkhateya sîstema navneteweyî de, gellek baş dikare alîkar be bo me, ji bo desteberkirina mafên rewa û neteweyî û demokratîk ên me di serdema niha de.

Bi van sedema ew qonaxa niha bo me Kurdan û bi taybetî di Rojhilata Kurdistanê de gellek hestiyar e, lewra hewce ye ku bi berçavgirtina wan pirs û guherînkarî û bingehan, em binihêrne guherînan û me xwendin li ser hebe, û xwe jêre amade bikin.

Xaleke din ya giring ku di vê rastayê de pêwendî bi Rojhilata Kurdistanê ve heye, û hêvîbexş e, ew e ku PDK wekî bingehdanerê Komara Kurdistanê, serbarê vê ku di heyama 68 salên borî de di jêr zexta tundûtîj ya rejîmên paşayetî û Îslamî de xwîn jê çûye, û bi hezaran xortên wê yên cangorî di berberekaniya digel vê rejîmê de şehîd bûne, û hatine zîndanîkirin, û ji bilî heyameke kurt, yanî di dema veguhastina ji rejîma paşayetî ve bo rejîma îslamî, berdewam têkoşerên wê li jêr lêpirsîn û gefxwarinan de bûye, û wekî partiyeke nayasayî, tekoşîna wê ya eşker hatiye astengkirin.

Serbarê bidarvekirina Pêşewa serkomarê vê komara sawa, û kesayetiyê yekemîn ê Partiya Demokrat a Kurdistanê, û terorkirina du sekreterên xwedî şiyan ên wekî Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî, û astengkirina tekoşîna wê, kariye ku li hemberî reşeba û bahoza bihêz ya bûyeran xweragir be, û alaya Komara Kurdistanê her bi vî awayî bilind ragire.

Xwendegeha pirr nawerok û pirr ezmûna demokrat û Komara Kurdistanê em hîn kirin ku li ser rêbaza Komarê ku mafê dîharîkirina çarenûsê ye, em pêdagir bin, û em şanaz in bi vê ku di heyama dehan salên borî de, em dirêjîpêderê xebata di pêxema bidestveanîna demokrasiyê û mafê çarenûsê bo gelê xwe bûne, ku bingeha Komara Kurditanê li ser hatiye danîn.

Niha jî diruşma sereke ya me damezrandina Îraneke demokratîk ya federal e ku têde hemû netewe û yek ji wan Kurdên vê para Kurdistanê, bi mafê wekhev cihê akincîbûna xwe birêve bibin, û li îdarekirina giştî ya welat de jî beşdar bin. Ew diruşm û daxwazî, daxwazên serdemiyan ne, û ezmûna bi dehan welatên demokratîk û pêşkevtî nîşan daye ku di welatên çend netewe de, ew şêweya birêvebirinê, şêweya herî serkevtî ya birêve birinê ye. Evne û gellek xalên din ku cihê baskirina li ser wan nine, bûne sedema vê ku PDKÎ, yanî partiya Komara Kurdistanê, di nava xelkê Kurdistanê de, cihê baweriyê be, û di guherînan de wê bikare careke din bi alîkariya xelkê Rojhilata Kurdistanê, Komara Kurdistanê zindî bike.

Di dawiyê de, me silav û rêz bo canê pak ê şehîdên Komara Kurdistanê, û hemû wan têkoşeran heye ku bi cangorîtî û qebûlkirina êş û fîdakariyê, rêbaza komarê herwisa pirr rêving û zindî ragirtine, ku di refa wan de birayên me ên Kurd di beşên cuda cuda bi taybetî di başûra Kurdisatnê wekî Barzaniyan bi serokatiya nemir mela Mistefa Barzanî û çar efserên welatperwer ên vê beşa Kurdistan, Îzet Ebdulezîz, Mistefa Xoşnav, Ebdulkerîm Xeyrollah, û Mihemed Mehmûd hene, ku di perwerdekirina pêşmergeyên Komarê de, roleke berçav hebûn, û di vê rêbazê de canê xwe gorî kirin.

**Silav li malbatên şehîdan**
**Silav li xortên demokrat dirêjîderên rastîn ên rêbaza Komarê**
**Serkevtin bo Kurdistanê**
**Neman bo dijminên Kurd, Azadî û Demokarsiyê**

# Nerîna Lîderan



**Cemîl Bayik:**

"Em dijberiya Turkiyê nakin, em piştgiriya hêzên demokratxwaz dikin".





**Altan tan:**

"Bila Enqere xwebirêveberiya Kurdên Sûriyê bi fermî nas bike".



**Baydên**

"Herêma Kurdistanê nabe bi serwet û heyiya Îraqê bilîze".



**Welîd Mu'elim:**

"Hevalbendiya Neteweyî nûneratiya tu kesî nake".

## Deqa axavtina rêzdar Kerîm Perwîzî endamê Deftera Siyasî a PDKÎ bi boneya 2'ê Rêbendanê, di binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ de



**Hemwelatiyên rêzdar!**
**Gelê azadîxwaz ê Kurd!**
**Hevalên birûmet!**

Em li vir, li dewra hevdu kom bûne, da ku rêz ji yad û bîranîna Komara Demokratîk a Kurdistanê bigrin. Komareke demokratîk ku 68 salan berî niha, di bajarê şoreşgêr ê Mehabadê de, bi destê Partiya Demokrat a Kurdistanê, û bi rêberatiya Pêşewa Qazî Mihemed hate avakirin.

Komara Kurdistanê ezmûneke siyasî ya nû, di dîroka xebata şoreşvanî û azadîxwazî ya Kurd de bû, Komara Kurdistanê avakirina sîstemeke siyasî ya îroyîn bû ku heya wê demê li ser xaka Kurdistanê nehatibû ceribandin, û bû yekemîn ceribandina deshilata siyasî bi awayê Komarî, serkomarî, û Heyeta Wezîran ya nû.

Komara Kudistanê selimandina neteweyekê bû, ku bi dehan û bi sedan salî, li jêr zulm û stemê de bû, û ji aliyê dagîrkeran ve mafên wê dihate binpêkirin. Komara Kurdistanê bû hêvin, û bû sembol, û da zanîn ku neteweyek bi navê neteweya Kurd heye, ku li ser mafên xwe pêdagir e, û heya gihîştina bi dawî kopka serkevtinê, nakeve qedeman. Komara Kurdistanê kiyaneke siyasî û neteweyî bû ku hem Kurd vejand, û hem jî bi hemû neteweyên bindest ên herêmê nîşan da ku riya azadî û rizgariyê çî ye?

Neteweya Kurd bi sedan salî li jêr stemê de bû, û hemû aliyekê banga wê dikirin ku Kurd qet nagîje tu tiştî, û Kurd dibe hertim bindest bimîne, lê Komara Kurdistanê vejiyana neteweyekê bû, selimandina neteweyekê bû ku bi hemû vê dagîrkarî û wan stemên ku li ser heye, namire û bi vejiyana xwe, û bi rabûna xwe, û bi avakirina kiyaneke siyasî, selimand ku ew neteweya jî wekî neteweyên din mafê wê heye ku bixwe xwe bi rêve bibe.

Komara Kurdistanê di wê serdemê de ku hate ragehandin, wekî hikûmeteke ne şareza û li ser bingeheke paremayiyane nebû, belkû li ser bingeheke îroyîn û modern bû ku peyameke modern hebû, wê peyameke nû hebû, û li ser bingeheke nû ava bû. Peyama azadî û demokrasiyê pê bû, peyama rizgarî û wekheviya neteweyan pê bû.

Em dikarin di dîrokê de daxuyaniya avakirina Komara Kurdistanê, wekî daxuyaniya ragehandina serxwebûna Amerîkayê bi nav bikin, ku herçend di serdema xwe de, di ciheke berteng û biçûk de hate avakirin, lê jiber ku peyameke mezin û girîng hebû, bû remz û sembola xelkê Amerîkayê, û Komara Kurdistanê jî bi heman şêweyî bû.

Bi peyama xwe ya girîng, û bi peyama siyasî û demokratîk ya îroyîn, bû remz û hêmayek bo neteweya Kurd, ku neteweya Kurd şanaziyê bi vê deskevtê dike, û li ser heman



rêbazê xebata xwe didomîne.

Girîngiya Komara Kurdistanê di çi de bû? Em di çend biyavan de dikarin deskevtên Komara Kurdistanê binirxînin, herçend ku bi dehan û bi sedan carî jî hatiye nirxandin.
Ya yekemîn di warê hizrî û boçûnan de:

Komara Kurdistanê peyama wekhevîxwaziya neteweyan pê bû, ku nîşan da ku neteweya Kurd, ne stemkar e, ne êrîşkar e, û ne jî êrîş û stem û çewsandinê qebûl dike, û peyama aştiyê û peyama wekheviya di navbera neteweyan de, ji hemû neteweyên herêmê re hebû, û di warê hizrî de, peyama wekheviya di navbera neteweyan de hebû.

Di biyavê siyasî de, Komara Kurdistanê, ezmûneke siyasî bû ku deshilateke demokratîk ava kir, ku rêz ji mirovan digirt, û niha jî, rêvîngên riya Komarê, bi girîngîdana bi wan nirxên ku Komara Kurdistanê afirandin, li ser heman rêbaz û heman koka siyasî ya Komarê, xebata xwe didomînin, û axavtinên siyasî ên wan hene, axavtinên ku wê demê nû bûn, û îro jî ji herêmê re nû ne. Axavtineke ku bas ji pêkve jiyana neteweyan, û bas ji aştî û azadiyê, û bas ji wekheviya mirovan, û bas ji mafê wekhev û cewherî yê mirovan dike.

Komara Kurdistanê di warê dîrokî de selimand ku neteweyek bi navê neteweya Kurd heye, û nemirî ye û namire. Neteweyeke xebatkar û şoreşvan e, ku li ser mafên xwe pêdagir e, û di dîroka xwe de, sitûneke din ya netewebûna xwe selimand. Her wekî tê baskirin, her neteweyek bona vê ku biselimîne ku netewe ye, dibe xwediyê çend paramêtrên hevpar be, yek ji wan paramêtran, paramêtra dîrokî ye û Komara Kurdistanê wekî ceribandineke dîrokî bo neteweya Kurd maye, û di niha û di pêşerojê de jî, li ser heman bingehê, neteweya Kurd de'îya (îdiaya) netewebûna xwe dike.

Di Komara Kurdistanê de, tenê eva nebû ku di herêmeke berteng de Komara Kurdistanê bihê avakirin, û rêberatî û kesên ku di wî bajarî û derdorê jiyan kirine, wê komarê ava bikin, û komarê bi rêve bibin, belkû xelkê Kurd ji hemû beşên Kurdistanê, di avakirina wê komarê û birêvebirina wê de hevbeş bûn.

Di hemû bajarok û di hemû herêmên Kurdistana Îranê de, xelkê şoreşvan û azadîxwaz û netewexwaz, rû li Mehabadê kirin, û rû kirne paytexta Komara Kurdistanê, û bi her awayî ku ji destê wan hat, bo avakirin û geşandina Komara Kurdistanê, di warê hizrî, rewşenbîrî, û di warê xebat û şoreş û cangorîtiyê de, xemsarî nekirin.

Ji Xoy û Makûyê ve bigre heya digihîje Kirmaşan û Îlamê, xelkê azadîxwaz ê herêmên Kurdistanê rû li rûgeha xebata neteweyî kirin. Di beşên din ên Kurdistanê de jî, di Kurdistana Turkiyê, û Îraqê, azadîxwazên wan beşan jî, rû li wê hêviya nû kirin, ku li ser wê xakê hatibû avakirin.

Gellek bas li ser hatiye kirin, û hewce ye ku dîsan em wan kesan bi bîr bînin ku bi riheke neteweyî, di pêxema selimandina hebûneke neteweyî de, bona gihîştina bi mafên neteweya Kurd, ji beşên din ên Kurdistanê hatne Mehabadê û di Komara Kurdistanê de, canê xwe gorî kirin.

Hewce ye ku em şoreşvanên Barzanî jî bi bîr bînin ku bi serokatiya rehmetî Mela Mistefa Barzanî hatne wir, em herwisa her çar efserên navdar ên şehîd ên Kurdistana Îraqê jî bi bîr bînin, ku di Komara Kurdistanê de xizmet kiribûn, û di dawiyê de jî, her bi tawana vê xizmeta ku bi Kurd kiribûn, ji aliyê dijminên Kurdan ve hatne îdamkirin.

Komara Kurdistanê herwekî me bas kir, ceribandineke siyasî û dîrokî ji bo Kurd bû, lewra dijmin û neyarên Kurdan çi wê demê, û çi jî niha hewla asîmîlekirin û ji rê derxistina armanc û peyamên wê dane, û li serveyî hemûyan Komara Îslamî ye ku bi projeyên berfireh hewla berevajî nîşandana dîrokê dide, û li ser hemû beşên Îranê û di nava hemû neteweyan de, li ser hemû azadîxwazan kar dike, û dixwaze dîroka wan tevgerên azadîxwaz ji rê derxîne, û rûçikeke kirêt û nehez ji wan nîşanî nivşên îroyîn bide.

Herwekî kirêgirtiyên Komara Îslamiya Îranê di vî warî de, gellek nivîsandine bona ku Komara Kurdistanê, wekî destçêkiriyê bîhaniyan nîşan bidin. Lê Komara Kurdistanê di dîrokê de hate selimandin ku destçêkiriyê bîhaniyan nebû, û li gorî hewcehiyeke dîrokî serî hildabû, û ji ber ku di dilê xelkê de hatibû avakirin, û rêberên wê jî di nava dilê wî xelkê de serê xwe bilind kiribûn, her di pêxema man û azadiya wî xelkî de canê xwe gorî kirin, û bûne sembol.

Komara Kurdistanê ser bi bîhaniyan nebû, eva hikûmetên dagîrker û hikûmetên nawendî di Îranê de bûn, ku ji serdema Qacariyan pêde, destçêkirê bîhaniyan bûye. Ji serdema Fethe'lî şahê Qacar ve bigre heya niha jî, hikûmeta nawendî di Tehranê de, li ser çar bingehan hatiye avakiirn ku emê îşarê pê bikin:

1- Sultaneke nexweş û serberedayî û nezan, û malperest. Ji wê demê pêde heya niha, ji hakimê yekemîn ve, ku rola sultanekê lîstiye, sultaneke nezan û nexweş û malperest bûye.

2- Derbareke gendel, û talançî li derdorê bûye, çi wê demê û çi jî niha, çi di serdema Qacar û Pehlewî de, û çi jî niha di Komara Îslamiya Îranê de, derbareke gendel û talançî, li dewra sultan hebûye.

3- Hikûmetên di Îranê de, li pey hev, xulamokê bîhaniyan bûne. Rûsye, Îngilîz, Feranse û Amerîkayê, sedrî e'zem û serokwezîr, û hakimên din ên Îranê diyarî dikirin.

Di navbera wan de rikeberî hebû ku her yek ji wan, sedr e'zemeke girêdayî bi xwe bînne ser kar, eva di dîroka Îranê de, wisa lê hatiye ku êdî çûye nava metelok û fulklura Îranê de, ew qas çûye nav xelkê de, ku xelkê Îranê, her hemû tiştekî, wekî pîlana bîhaniyan dihesibînin, jiber ku pîlanên bîhaniyan, û xulamokiya hikûmetên destçêkirî di Îranê de ew qas kûr, û eşkere bûye, ku di dîrokê de nayê weşartin, û niha jî wisa ye, niha jî em çav lê dikin, her hakimeke nezan li ser kar e, û derdorek, nivîsîngehek, û binyateke talançî û gendel wê deshilatê bi rêve dibe. Ew hikûmetên ku têne ser kar, her yek ji wan dixwaze ku ji bo berjewendiya welatekê kar bike, û tenê berjewendiya xwe berçav digrin.

4-Serkut di navxwe de, û xulamokiya bo bîhaniyan:

Niha jî Komara Îslamî ya Îranê, li ser heman şêweyî dimeşe, dema em çav li Komara Îslamî dikin, di heyama 35 salan de, her demekê berjewendiya wê digel welatekî û digel cihekî bûye, niha jî Komara Îslamî ya Îranê zêdetir di pêxema berjewendiya welatên mezinhêz ên wekî Rûs û ...hwd de kar dike, û di navxwe de gendelî û talan di rê de ye, û xulamokî bo derve heye. Komara Kurdistanê xulamokê bîhaniyan nebû, belkû hikûmetên nawendî di Îranê de ser bi bîhaniyan bûn, û li dijî xelkê Îranê stem û

zulm bi rêve dibirin.

Niha di Îranê de kesekî wekî Rûhanî bi sînaryoyeke hilbijartinê anîne ser kar, û wisa bas dikin ku ew di hilbijartineke demokratîk de hatiye hilbijartin, lê di rastî de ew hilbijartin dadperwerane û azadane nebûye, û nine. Wî hinek qewl û soz dan ku ew dê dadperwerî, û nermrewiyê di siyasetê de berçav bigre. Hinek kes jî ku ji derfetekê digeriyan ku tevlî baregeha hikûmeta Komara Îslamî bibin, kêfxweş bûn bi hatina Rûhanî. Wan jêve bû ku Rûhanî wê guhertinan pêk bîne.

Emê di vir de sê tiştên girîng ên Rûhanî bas bikin, ku gelo Rûhanî tiştên nû ji xelkê re hene yan ne. Di konferansekê de, Rûhanî piştî serkomariya xwe, di bersiva pirsyarekê de ku gelo di Îranê de, neteweyên cuda hene yan ne, wî got ku di Îranê de tiştek bi navê neteweyên cuda tunine, ya ku di Îranê de heye, hûrde çand e, û hûrde çand jî li gorî pênaseya xwe ya civakî, yanî kesên ku karê wan û pîşeya wan wekî hevdu ye, û dikarin nêzîkatî, û rabin û rûniştin bi hevdu re hebin, eva dibe hûrde çand. Yan jî eva ku digotin Rûhanî tiştên nû ji bo xelkê Kurd hene, û daxwaziyên Kurdan di diyarîkirina berpirsekî, û di parêzgarekî de kurt dikirin, û asta daxwaziyên neteweyî dianîne xwar, bona vê ku kesekî ser bi rejîmê di cihekê de danên, Rûhanî bersivek da wan jî.

Me dît ku di hemû parêzgehên Kurdistanê kesên Îtila'atî û emniyetî ên ser bi Sipaha Pasdaran ji cihên din anîne, û kirine parêzgarê parêzgehên Kurdistan, Kirmaşan, Urmiyê, û Îlamê, û wezîrekî Rûhanî jî dibêje ku di herêmê de me kesekî jêhatî nedît ku bikne parêzgarê Kurdistanê, yan jî em kesekî hêjayî xizmetkirina bi Komara Îslamî li wir nabînin ku di wekî parêzgar, xizmetê bi wan bike, belkû dibe li asteke gellek nizimtir de kesên xizmetkar em destnîşan bikin.

Di pêngava herî nû de, Rûhanî û derdora wî, pêşnûsek amade kirine, bi navê pêşnûsa çalakiyên partiyan, ku hizbayetî di Îranê de bi çi awayî be. Ya ku wan bawerî pê nine, hizbayetî û hizb û organîzasyona modêrn e, her wekî Xomênî got "Hizb tenê Hizbullah", û partiyên din hilweşandin, niha ew û derdora wî basê wê dikin ku em riya yasayî didne partiyan.

Pêşnûsek amade kirine ku têde



**Komara Kurdistanê herwekî me bas kir, ceribandineke siyasî û dîrokî ji bo Kurd bû, lewra dijmin û neyarên Kurdan çi wê demê, û çi jî niha hewla asîmîlekirin û ji rê derxistina armanc û peyamên wê dane, û li serveyî hemûyan Komara Îslamî ye ku bi projeyên berfireh hewla berevajî nîşandana dîrokê dide**

basê wê dikin ku kesên çalak di warê karê hizbî de, dibe baweriya bi kiryar bi Wilayeta Feqîh hebin. Herwisa di pêşnûsê de, basê wê dikin ku ew partiya tê avakirin, bi çi şert û mercan tê hilweşandin, yanî heya di pêşnûsa xwe de, çalakiyên partiyan di çarçoveya yasayên Komara Îslamî de jî qebûl nakin, evna siyasetên Rûhanî li navxwe ya Îranê, di hemberî neteweyan de ye, û di derve de jî, xulamokê bîhaniyan in.

Niha piştî çendîn salî ku serwet û heyiya welat dane ba, niha piştî çendîn salan gefxwarinên wan, û eva ku bas ji nîşandana birêveberiya nû (modîriyeta nû) bi welatên cîhanê dikin, niha piştî milyardan dolarî serweta vî welatî ku di pêxema serhişkiya etomiya xwe de xerc kirine, û milyardan dolarî zirara ku li serwet û saman vî welatî di encama gemaroyan de dane, lê niha teslîmî bîhaniyan bûne, û amade ne ku pirojeyên xwe rabigrin, û dîsan diselimînin ku di pêxema mana xwe de, wê xulamokiyê bo bîhaniyan bikin, lê di navxwe de, wê serkutê her birêve bibin.

Em rêvîngên riya Komara Kurdistanê, em bi zanîna hemû wan rastiyên dîrokî, û hemû wan rastiyên ku niha hene, li ser maf û daxwaziyên xwe pêdagir in, û emê xebata xwe, û şoreşa xwe bidomînin, û di dijwartirîn şert û mercan û qonaxan de, li ser daxwazkariyên xwe emê pêdagir bin.

Komara Kurdistanê û Partiya Demokrat a Kurdistanê, ku avakerê Komara Kurdistanê û dirêjîderê rêbaza komarê ye, çend peyam hene ku hewce ye em îşarê bi peyamên wê bikin:

Yekem: Em wekî Kurd neteweyek in bi hemû taybetmendiyên neteweyeke azad û azadîxwaz ku tu carî, tu dijminek nikare me ji nav bibe, û dîsan emê rojekê bibne xwediyê kiyana xwe.

Duyem: Peyameke din ya Partiya Demokrat a Kurdistanê, û Komara Kurdistanê, ew e ku em daxwazkarê jiyaneke baştir û asûdetir û îroyîn ji bo xelkê ne, daxwazkarê wê nînin ku rêzbenda şehîdên me zor bin, me peyama mirinê jî tunine, peyama jiyanê me heye, jiyanek baştir bo hemû xelkê.

Sêyemîn: Peyameke din ew e ku em azadiyê bo xelkê Îranê, û bo neteweya Kurd û di nav Kurd de jî, bo hemû girûp û takekî bînin. Em azadiyekê dixwazin ku bi awayekî dadperwerane bi ser hemû xelkê de bê parvekirin, ev peyamane, peyamên girîng ên Komara Kurdistanê ne, ku em digel wan peymanê girê didin, û dirêjiyê bi rêbza Komara Kurdistanê didin.

Di vir de hewce ye ku em rêz ji yad û bîranîna şehîdên serbilind ên neteweya xwe bigrin, û rêz ji şehîdên Komara Kurdistanê û bi taybetî şehîdên xwe ên nû bigrin, ku di pêxema bilindragirtina salvegera avakirina Komara Kurdistanê li Hewşarê şehîd bû. Herwisa ez îznê dixwazim ku ji aliyê Deftera Siyasî ve silavan bo hemû malbatên şehîdan bişînim, hemû şehîdên ku canê xwe di riya azadiya nîştimana xwe de gorî kirine, û ew malbatên ku şanaziyê bi cangorîtiya xortên xwe dikin.

**Em silavan dişînin bo hemû têkoşerên gel**

**Silav bo hemû têkoşerên demokrat ku dilê wan bo avakirina komareke wekî ya Komara Kurdistanê lê dide**

**Silav bo hemû girtiyên siyasî ên xweragir**

**Bi hêviya vê ku neteweya Kurd û hemû neteweyên Îranê bigîjne mafên xwe yên rewa**

**Bi hêviya neman rejîma kevneperest ya Komara Îslamî**

**Bi hêviya Îraneke demokratîk û Federal**

## H: Rehîm Gerguli

**Birêz Ebdulla Resûlî naskirî bi Ebdulla Gunde kurê Îbrahîm, sala 1326 (1947)'an li gundê Qubad Beygiyan a ser bi devera Menguran ya Pîranşarê hatiye dinê.**

**Kekê Ebdulla Resûlî jî weke piraniya zarokên Kurdistanê ên wî çaxî, bi sedema destengî û hejarî û herweha tunebûna îmkanatên xwendinê, nikare here xwendingehê, û ji xwendinê bêpar dimîne û dest davêje karê ajeldariyê.**

Rêzdar Ebdulla Resûlî derheq çavaniya nasîna pêşmerge û PDK Îranê weha dibêje: "Ez li Xerepapanê şivan bûm û li çiya û çolan digeriyam, gellek caran Seyîd Resûlê Babê Gewre, Ebdulla Mo'înî û Salih Lacanî dihatin bal min û bi vî awayî min PDK Îranê û pêşmerge nas kirin. Tê bîra min ku rojekê şer û pevçûn di navbera Melbenda Sipîseng û hêzên Komara Îslamî de çê bû, û Ebdulla Mo'înî birîndar ket, wî çaxî me jê pirsyar kir ku gelo tu çima birîndar ketî? Wî di bersiva me de got ku ez li ser dîwar ketim xiwarê, lewra wusa birîndar bûm".

Birêz Ebdulla Resûlî tevlîbûna xwe bi PDK Îranê re weha tîne ziman: "Di yekemîn heyva sala 1358 (1979)'an de, dema ku baregehên PDK Îranê li Gundê Gulfetê bûn, ez bûm pêşmerge û heya niha jî li ser rêbaza xwe sor û pêdagir im, û xatircem im ku wê her berdewam bimînim jî".

Pêşmergê qehreman ê PDKÎ, Ebdulla Resûlî herweha dibêje ku: "Di heyama pêşmergatiya xwe de, min bi dilek pak û bi ew qasê cangorîtî û di pêxema bidestxistina mafên gelê xwe de, di 65 şeran de beşdarî kiriye, û du caran jî birîndar ketime".

Ebdulla Resûlî roja herî xweş a jiyana xwe weha tîne ziman: "Ez pêşmerge bûm û baregehên me li Sînemokê bûn, Dr.Qasimlo hat û civînek ji bo pêşmergeyan pêk anî, min bi awayekî gellek bê serûber, çek û rextên xwe girê dabûn, di civînê de ez rabûn û min nêrîna xwe li ser rêkxirawa "Mucahidînê Xelq" anî ziman, û min got ku tu ferq û cudahiyek di navbera pasdarên rejîmê, û Mucahidînan de nine, Dr.Qasimlo hate bal min û di despêkê de çek û rextên min sererast kirin û paşan got ku eva nêrîna te ye, ne nêrîna PDK Îranê, eva roja herî xweş a jiyan min e ku tu caran ji bîra min naçe".



Ebdulla Resûlî (Ebdulla Gunde), pêşmergeyê PDKÎ

"Min got ku tu ferq û cudahiyek di navbera pasdarên rejîmê, û Mucahidînan de nine, Dr.Qasimlo hate bal min û di despêkê de çek û rextên min sererast kirin û paşan got ku eva nêrîna te ye, ne nêrîna PDK Îranê, eva roja herî xweş a jiyan min e ku tu caran ji bîra min naçe".

Herweha Ebdulla Resûlî derheq roja herî nexweş a jiyana xwe weha diaxive: "Baregehên me li Cavkanê bûn ku Radyoya Dengê Kurdistana Îranê (RDKÎ), nûçeya şehîdketina Dr.Qasimlo ragehand, ku nûçeyeke pirr dilêş û cergbir ji bo tewahiya pêşmergan bû, jiber ku niha jî birînên jidestdana Dr. Qaqimlo û Dr. Sadiq qenc nebûne".

Ebdulla Resûlî derheq jiyana xwe ya hevpar dibêje: "Sala 1364(1985)'an baregehên me li Seweyê bûn, Seyîd Resûl Çûke ez gazî kirim û gote min, dema çûyîna hêzan bo menteqê ye, lewra hekî tu niha di baregehê de bimînî û neçî menteqê, piştî vegeriyana hêzê, ezê heyvekê îznê bidim te bona bêhnvedanê, min daxwaza wî qebûl kir û di dema îzindanê de, ez çûme gundê Kewper a ser bi bajarê Pîranşarê, û min qîzek bi navê Miryem razî kir û min revand, bi vî awayî min jiyana xwe ya hevpar ava kir, û berhema jiyana me jî 3 keç û 4 kur in".

Rêzdar Ebdulla Resûlî rû li xelkê Kurdistanê û bi taybetî xortan dike û bi vê gotinê hevpeyvîna xwe ya bi Agirî re, bi dawî tîne: "Peyama min bo xelkê Kurdistanê ev e ku digel hevdu baş bin, û bi her awayekî be, tevlî şoreşê bin û netirsin, jiber ku her weke Dr.Qasimlo dibêje "Ew gelê ku azadiyê bixwaze, dibe buhaya vê azadiyê jî bide".

Ebdulla Gunde herweha di peyama xwe de daxwazê ji xortên Kurdistana Rojhilat dike ku tevlî şoreş û PDK Îranê bin, û hekî nekarîn vî karî bikin, mijûlî xwendin û kasibiyê bin û nekevin telika dezgehên sîxorî, û çekdarî yên Komara Îslamî ya Îranê, û herweha serbarê vê ku %90 ji xelkê Kurdistanê Musilman in, lê daxwazê ji wan dikim ku destan ji wan kesan bikişînin ku bi awayekî xirab mifahê ji Îslamê distînin bi navê Îslamê xelkê Kurd bi giştî û xortan bi taybetî dixapînin".



# Li bajarê Sine 10 hezar nexweşên şekirê hene




**Rûdaw – Li parêzgeha Sine ya Rojhilatê Kurdistanê 10 hezar nexweşên şekir (diyabêt) hene. Pisporên diyabêtê dibêjin, ev rêje her ku diçe zêde dibe.**

Li gorî ajansa Mêhr a Îranê, berpirsa navenda nexweşiya şekir a zanîngeha pizîşkî ya Sine, Dr. Nadiyê Şekîba ragihand, niha li navenda wan, navên 10 hezar nexweşên şekirê hatiye nivîsandin.

Dr. Nadiyê Şekîba, anî ziman ku rojane nêzîkî 100 nexweşên şekir bo kontrolkirin û lêkolînên hewce serdana wan dikin û got, ew jî li gorî derfetan xizmeta wan dikin.

Rêveberê pêşîgirtina nexweşiyan ê zanîngeha pizîşkî ya Sine, Mihemed Kerîmî jî got, li gorî amarên fermî heta niha %4 ji xelkê parêzgehê bi nexweşiya şekirê ketine, lê tê pêşbînîkirin ku li seranserê parêzgehê nêzîkî %8 nexweşên şekirê hebin ku temenê wan li ser 25 saliyê re bin.

Mihemed Kerîmî destnîşan kir ku rêjeya nexweşiya şekirê li parêzgehê ber bi zêdebûnê ve dice, û ragihand ku divê rê û şûnên hewce bo çavdêrî û pêşîgirtina ji zêdebûna nexweşiyê bêne girtin.

# Roja herî baş ya devjêberdana cixarê roja duşemê ye




**Rûdaw - Li gorî lêkolîneke nû mirov herî zêde roja duşemê derbarê devjêberdana cixarê de, dixwînin.**

Lêkoleran encamên lêgerînên înternetê yên di navbera salên 2008 û 2012'an de berhev kirin, û derxistin ku piraniya kesên dixwazin dev ji cixarê berdin, li rojên duşemiyê, di vê derbarê de, hizran dikin. Lêkolîn li ser lêgerînên bi zimanên Îngilîzî, Çînî, Fransî, Rûsî û Îspanî hat pêkanîn.

Di encamê de diyar bû ku mirov roja duşemê ji rojên din bêhtir hez ji devjêberdana cixareyê dike. Di heman demî de diyar bû ku li gorî rojên sêşeman heta yekşeman, rojên duşeman lêgerînên derbarê devjêberdana cixarê, %25 zêdetir e. Bi vî awayî diyar bû ku mirov dixwazin di destpêka hefteyê de, dev ji cixarê berdin.

Ya herî di vê lêkolînê de balkêş jî, ew bû ku di lêgerîna her şeş ziman-an de jî, encama pileya hezkirina ji devjêberdana cixarê ya roja duşeman nêzîkî hev in.

# Mêr jî giringiyê didne ciwankariyê




**Li gorî gotina xisarnasekî civakî, ciwankarî di nav jin û mêran di Îranê de, li wan pênc salên dawiyê 10 hember zêde bûye.**

Li gorî rapirsiyan ji her pênc kesên ku bona ciwankariya difinê (pozê xwe), serdana doktoran kirine, du kes mêr in.

Li gorî zanyariyan têçûya emeliyata ciwankariyê li nav mêran di Îranê de, salê zêdetir ji 50 milyard tûmenî ye, û piraniya yên ku ciwankariyê dikin temenê wan di navbera 15 heya 30 saliyê de ye.

## Dilê “Yekîtiya Ciwanên Kurd ên Gurcistanê” ji bo Kurdistanê lê dide



**Rûdaw- Li Gurcistanê piştî nîveka salên 1950'î çend sazî û dezgehên kurdan têne avakirin.**

Yek ji wan dezgehan “Yekîtiya Ciwanên Kurd ên Gurcistanê” ye, ku ev çend sal in bi proje, çalakî û organîzasyonên xwe hewla têkiliya ciwanên kurdên Gurcistanê û ciwanên welatên din dide. Ji bo vê saziyê, rojên çanda kurdî, têkilîsaziya ciwanên kurdên seranserê cîhanê, û parastin û pêşxistina çand, ziman û hunera kurdî armanca sereke ye.

Li Gurcistanê xebata ciwanên kurd sala 1957'an bi pêşengiya Keremê Anqosî dest pê kiriye. Rastiyek heye ku ciwanên îro şopînerên wan salan in.

Seroka Ciwanên Kurdên Gurcistanê Elena Xudoyanî diyar dike ku armanca wan, ew e ku ne tenê li Gurcistanê, her wiha li seranserê cîhanê têkiliyên wan bi ciwanên kurdan re hebin.

Li gorî gotina Xudoyanî, dezgeha wan hem li Gurcistanê, hem li Kurdistanê, hem jî Ewropayê li ser yekîtî û entegrasyona ciwanên kurd kar dike. Ew dibêje: “Ji bo me parastin û pêşxistina çand û hunera kurdî mîna “nan û avê” girîng e.”

Ew herwisa dibêje ku: “Her çiqas ew li Gurcistanê bin jî, dil û hişê wan li Kurdistanê ye. Hêviya wan ew e hem li Başûr, hem jî li Bakur sazî û dezgehên kurdan hay ji wan û xebatên wan hebin û bi hev re karên hunerî, çandî û civakî bikin.

## Zimanê Neteweyan dîsan bû armanca êrîşan

Di vê daviyê de, ji aliyê dewleta Îranê ve pêşniyara vê yekê hate kirin ku zimanê dayîkê di parêzgehên Îranê de bê xwendin, lê piraniya endamên ferhengistana ziman û edebiyata Farsî dijberiya vê yekê kirin ku zimanên neteweyên din, di Îranê de bê xwendin, û wan xwendina bi zimanê dayîkê di parêzgehên din bi gefek micid li ser zimanê Farsî dane zanîn.

Fethulla Muctebayî, yek ji endamên ferhengistana ziman û edebiyata Farsî, ragehandiye: “Min şik têde nine ku ev mijara ji dervayî welat hatiye Îranê, û di salên borî de jî, li Hindûstanê ev pirsa ji aliyê Birîtaniyan ve hatiye ezmûnkirin, û îro jî hinek Birîtaniyayî û welatên bakûr in ku dixwazin mijara han bînne nav Îranê.




Wî di gotinûn xwe de ew yek jî zêde kir ku: “Baştirîn alav bo paşvehêlana her neteweyekê guhnedan bi zimanê wan e, û hekî em bixwazin zimanê dayîkî weke zimanê zanistî û perwerdeyî bi kar bînin, ez xatircem im ku emê bo paşve vegerin, û ev mijara cihê tirsê ye, û bêhna pîlanan jê tê.

## Hinek ji mozîkan zirarên derûnî û leşî hene

**Nûçegihaniya Mêhr: Ayetullah Ha'irî Şîrazî dîtingehên xwe di warê pirsên çandî, û alîkariya di navbera ol û zanistê, û di biyavên curbicur û bi taybetî di warê hunerê de eşkere kir.**



Wî got: “Gelo zanstê di warê mozîkê de gotinên xwe yên dawiyê kirine? Ne, nekirin e. Gelo eva ku hin mozîkan zirarên derûnî û leşî hene, ma cihê pirsê ye? Ne. ku wisa bû dema ku me tiştek heye ku dikare bo saxlemiyê zirar hebe, û şer'i jî ew yek qedexe kiribe, ma tu pirsgirêkek heye?

Gelo ma mirov nikare bi alavên mozîkê jî hesta mirovan bilivlivîne? Her wek ku vexwarinên elkolî jî, îxtiyarê ji mirovan distînin, mozîk jî dikare îxtiyarê ji mirov bistîne.

Zanistê hêj dîtingehên xwe yên dawî di warê beşên mozîkê, wate ew beşên ku zirar, û beşên ku qazanc hebin nedaye, ku waye zanayê olî jî dîtingeha xwe ya dawî bas nake, tenê di vî warî de nebe, ku mozîk bibe sedema têkçûna leş, ku ew yek li gorî ola Îslamê heram e.

# Gotinên Navdaran



A: Firat Cewerî

**Pejirandina şaşiyekê, bidestxistina serfiraziyekê ye.**

C. L. Gascoinge

**Tiştê ku tu rast dibînî bike, te divê bila dinya xerab bibe.**

Herbert

**Mirov çi bixwaze dikare bike.**

Montaigne

**Berî tu dest pê bikî baş bifikire, lê ku te dest pê kir jî zû dawî bîne.**


Sallust

**Kirinên mirovan ji Xwedê ve xuya ne.**

Ovidius

**Temen jî mîna evînê ye, nayê veşartin.**

**Thomas Dekker**







# Tiştonek



A: Mahir Berwarî

**1- Helvandira, helwandira, dihavêt lotik û qendira, şaxêt bizina, guhêt kera. (kervîşk, kîroşk)**

**2- Mûtê bê pûte, dixot û narrîte. (Qirnî)**

**3-Êk dihat ji deştê, milekê sitirî ya li piştê, min gut mam dê çi key? Gut dê çime Beheştê.**
**- Feqîrek têtu ji deştê, piştiyekê sitiriya li piştê. Kalo tê ji deştê, barê stiriyan li piştê. (Jûjî)**

**4-Giyay dixot ne kar e, ser mişk e qon mar e, ne mişk e ne mar e.**
**- Tiştek heye tiştanok, li ber kevir xiştanok.**
**- Ser textik e, bin textik e, giya dixwe ne karik e.**
**- Tiştek heye ser text e, bin text e, di nîvê de pîrek e bêbexte. (Kîsel/kusî)**

**Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye**



**Xwendevanên Hêja! Hinek hevalan bersiva van metelokan ji me re şandin, ku hinek ji wan bersiva hemiyan, û hinek ji wan jî bersiva çend metelokan durust dabûn, hinek ji wan jî tu bersiveke wan durust nebû.**

Yên ku bersiva rast dabûn, ev kesane bûn:

1) Birêz Kavûs ezîzî ji welatê Danmarkê

2) Birêz Silêma Keleşî ji Danmarkê

3) Birêz Ebdulrehman Bamernî ji Duhokê, başûrê Kurdistan

4) Birzê Samî Herkî ji başûrê Kurdistan

5) Birêz Helîme Qadirî ji Koye-Başûrê Kurdistan

6) Argeş Urmiye, ji bajarê Urmiye

**xwendevanên hêja!**

**Hûn dikarin bersiva van tiştonekan (metelokan) bi riya E-maila Agiri2003@gmail.com ji me re bişînin.**

# AGIRÎ

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Tel: (+)9647503640792


## Wêneyên rêûresma 2’ê Rêbendan, Koye - Kurdistana Başûr











